

KVALITETSREGISTER SVENSKA BARNCANCERREGISTRET

AGEHÎ BO ZAROKAN Û CIWANÊN LI BIN 18 SALAN DERBAREYÊ SVENSKA BARNCANCERREGISTRET'Ê (TOMARA SWÊDÎ YA PENCEŞÊRÊ BO ZAROKAN)

Nexweşiya penceşêrê, nexweşiyeke irsî ye, wek nimûne nexweşiyên xwînî li nik zarokan kê m tene dîtin. Ji ber ku ev nexweşî kê m diqewimin. Loma jî em nikarin bo çareserkirin û dermankirina van nexweşiyên rêç û azîneyên bi tesîr ji bo wan zarokên bi vê nexweşiyê ketine, peyda bikin. Em hewla didine xwe, da ku em bi heman şeweyî dermankirina gelek zarokan, riya sexbêriyeke herî baş peyda bikin. Paşê em, hem li gor destkeftên dermankirinê, encamên li dest xwe, bi carên berê re rûber dikin û hem jî, bi grûbeke din a zarokên ku bi şeweyên cihê hatine dermankirin, rûber dikin. Ji bo ev rûberkirin bikaribe bibe rûberkirineka herî baş, divêt agehiyên derbareyê her zarokê li tomarekê were tomarkirin. Bi alîkariya komkirin û pêdaçûna van agehiyan, mirov dikare paşê karên sexbêriyê baştir bike û gelek zarokên din hingê dikarin ji vê nexweşiyê bifilitin.

Ji bo em bikaribin kwalîteya sexbêriya nexweşan pêşbixin û ewletir bikin, Nexweşxaneyê Te

divê agehiyên derbareyê te verêke bo Nationella kvalitetsregistret – Svenska Barncancerregistret (Tomara Kwalîteya Netewî – Tomara Swêdî ya Penceşêrê ya bo Zarokan). Ew dezgeha Navendî ku ji vî karê tomarkirina agehiyên kesane, berpirsiyar e; Karolinska Universitetssjukhuset e. Ev nexweşxane, li warê agehiyên kesane yê li tomara Svenska Barncancerregistret'ê xwedî berpirsiyariyeke huqûqî ya giştî ye. Gava bidestvehanîna van agehiyên kesane, ku dihêne komkirin û dihêne şandin bo Svenska Barncancerregistret'ê Nexweşxaneyê Te

jê berpirsiyar e.

TU BI ALÎKARIYA PEYDABÛNA SEXBÊRIYEKE BAŞTIR RADIBÎ

Bi alîkariya agehiyên li tomarê û bi alîkariya testên parastî, me hêvî heye, ku em xwe bigehînin encamên êdî baştir ên sexbêriyan. Li heman demê jî, me hêvî heye ku em rîskên êşên rex jî kê mkin. Ji bo em bikaribin xwe bigehînin encamên ewle, pêwîst e, ku em têra xwe agehiyan ji gelek zarok û ciwanan ko bikin. Ji ber ku van nexweşiyên, nexweşiyên ne asayî ne, loma me divêt em carina di gel doktorên gelek welatan hevkarîyê bikin, da ku em bikaribin agehî ji gelek zarokan bigehînin hev. Hingê mirov li ser protokoleke hevbeş a sexbêriyê bi hev dike, ku ev li ser hemû zanyariyên berdest ava bûye.

Ji bo mirov bikaribe encaman bi sexbêriyên nexweşên berê re rûber bike, hingê mirov agehiyên li ser nexweşan, nexweşiyên û sexbêriyan ko dike. Ev agehî, li tomarekê tê parastin, ku li wan welatên ku li gor protokolê hevkarîya hev dikin heye. Pêwîst e ku mirov her dem agehî derbareyê vî karê tomarkirinê bide ew kesê nexweş. Carina jî, ji bo parastina agehiyan a li vê tomarê, divêt mirov destûr ji kesê nexweş bigre. Her wisa, heger tu êdî li Barnkliniken'ê nemabî, hingê me divê em li rojên pêş, agehiyên ji wan klînîkên ku bi karê tendurustiya te radibe, ko bikin.

KVALITETSREGISTER SVENSKA BARNCANCERREGISTRET

Beşdarbûna li Svenska Barncancerregistret'ê li ser xwesteka mirov e û tesîrek nake li ser sexbêriya ku bo te dihêt kirin.

AGEHIYÊN DIHÊNE TOMARKIRIN

Ji bo pêşxistin û ewlekirina kalîteya sexbêriyê, me divêt em agehiyên personnummer a te, zayenda te, çîroka nexweşiya te, pêwendiyên te yên li dezgehên sexbêriyê, dîagnosên te, sexbêriya bo te hatiye kirin, encama testên te, agehiyên rontgenên te, taybetmendiyên nexweşiya te û agehiyên rewşa tendurustiya te ya dawiyê tomar bikin.

Ev agehî paşê dihête verêkirin bo Svenska Barncancerregistret'ê û dibe, ku her wisa bihête şandin bo ew navenda vekolînê ya ku berpirsiyar e ji protokolê (ev navenda vekolînê dibe ku li welatekî din be jî).

NIHÊNÎGIRTIN Î EWLETÎ

Agehiyên li Svenska Barncancerregistret'ê, bi qanûnên nihênîgirtinê parastî ne. Ev tê wê watêyê, heger li derdana agehiyekê rîskek hebe ku xisarek bigehîne te, hingê qet agehiyek jî çênabe ji wir bihête der. Ji bo kesek ji derve xwe negehîne van agehiyan, tedbîrên taybetî yên nihênîgirtinê hene. Ji bo kesek ji derve xwe negehîne van agehiyan kontrol hene, Bo xwendina agehiyên te yên kesane, kilîta krîpto pêwîst e.

DEST GIHANDIN

Li hin deman, doktorê zarokan li nexweşxaneyê te û her wisa jî ew kesên ku xwedî erka kontrolkirina kalîteya karê tomarê dikan, dikarin yekser xwe bigehînin agehiyên te yên kesane. Çi nexweşxaneyên din ên derveyî vî karî, nikarin destê xwe bigehînin van agehiyan.

Agehiyên kesane yên te, ta ku bo vekolînan pêwîstî bi wan hebe, wê li nav tomarê û karê pêşxistinê hebin. Li nav raportên vekolînan û raportên din, li nav agehiyên dihêne ku berdestkirin, navê te û kesên din ên nexweş nayê diyarkirin û naskirin.

- Te maf heye tu ji bo tomarkirina agehiyên xwe yên kesane ya li Svenska Barncancerregistret'ê bêjî na.
- Te maf heye ku te kengî xwest, agehiyên te ji nav tomarê bihêt rakirin.
- Te maf heye tu bizanî ku çî agehî derbareyê te hatiye tomar kirin.
- Heger beşek ji agehiya li ser te bi xeletî hatibe tomar kirin, te maf heye tu wê agehiya xelet bidî sererastkirin.
- Te maf heye ku tu agehî derbareyê ew yekîneya sexbêriyê, ku xwe gihandiyê agehiyên te yên kesane, bizanî kî ye.
- Te maf heye ku heger li warê erka nihênîgirtinê şaşiyek hatibe kirin, hingê pere (tezmînat) werbigirî.

AGEHIYÊN PÊWENDIYÊ

Heger te derbareyê, Svenska Barncancerregistret'ê, yan derbareyê wan agehiyên kesane yên xwe bêhtir agehî divên, hingê tu dikarî berê xwe bidî:

Information till barn och ungdomar under 18 år om Svenska Barncancerregistret, revisionsdatum 2019.10.14

KVALITETSREGISTER SVENSKA BARNCANCERREGISTRET

Nationellt kvalitetsregister – Svenska Barncancerregistret, Karolinska Institutet,
Barncancerforskningsenheten, Tomtebodavägen 18A, vån 8, 17177 Stockholm (Solna)

Telefon: +46 8 52482365

E-mail: svenska-barncancerregistret@kbh.ki.se

Heger te divê tu pêwendî bi *Dataskyddsbudet* a li

yan li Karolinska Universitetssjukhuset'ê bikî:

Dataskyddsbudet

Karolinska Universitetssjukhuset

17176 Stockholm

Telefon: 08-517 700 00 (växel)

E-post: dataskyddsbud.karolinska@sll.se

Heger bi bîr û baweriya te, agehiyên tam bo te nehatibin dayin, hingê baştir e ku tu bi doktorê berpirsiyar re biaxivî. Heger te pirs hebin, grîng e ku tu bipirsî.

Nusxeyek kopya vê bo kesê nexweş dihête dayin.